

Agahîyên grîng ji bo Xizmetkarên (Kulekvanan)

I. Giştî

Bi karê kulekvanî hûn xizmetêk grîn ya hemwelatîyê tînin cîh. Ev kar û xizmeta han hûn bi wîjdan û însaf û bir berpirsyariyek tenê ji bo kulekan dê bikin.

Ev pergelen kanûnî di derheqê kulekvanîyê de di Makekanûna gelî de ne (§§ 1909 hetan 1921).

Gora § 1915 BGB (Kanûna Welatî) agahîyên Temîvanîyê di (§§ 1773 bis 1895 BGB) bi kar tînin anîn. Temîya me ji we ra van kanûn û qaideyan nas bikin.

Dadgeha Malbatî karê we temaşe dike û ji we ra digel hemû karên we yê fermî de şewirmendîye dike.

Dadgeha Malbatî dikare herdem ji we agahî di derheqê karê we da bixwaze û ev agahîyan hûn mecburin bidin.

Hûn ji hemû zerrarên kulekvanan berpirsyarin. Ev berpirsyarî beriya her tiştî di dema ku hûn wezîfa xwe bi cîh tînin ji bo kulekvanan û mafên kulekvanan hûn tînin cîh. Di derheqê ewlehîya we da û agahîyên berfireh hûn dikarin her dem alîkarî ji Dadgeha Malbatî bigrin.

Perê kulekan hûn dê bi faiz di banqekî de biparêzin, ger ev pere ji bo xerc û mesrefên kulekan ne bi kar hatibe û lazim nebe. Ev banqe dibê ya dewletê be wekî banqeyên bajar. Dadgeha Malbatî dikare digel vî karê han de ji bo dîtina banqekî alîkarî li we bike.

II. Tenê li ba Nefeqet û mesrefan

Ev xalên jêr ji bi rêzgirtinê gelek girîng in:

1. Wezîfa we ya asta herî yekem ev e kû, hûn ji bo malbatên kulekan wezîfa xwe bînin cîh kar bikin, da kû ew perêyên zarokên xwe ku heqê wanê bicîh bînin. Ji bo vî karî dibê hûn berê bi nivîskî xeber bidin wan malbatan. Mafê Alîkarîya jîyanê di kanûna gelî de di §§ 1601 hetan 1615 ye. Mafê Nefeqetê ya zarokan ji bo jîyana rojane derbarkirin, ji xwendin û dema perwerdebûnê mecbûrî ye. Ji bo vê nefeqetê miktarek kanûnî nehatiye nivîsin û tûne ye. Ev malbatên kû nefeqet didin, rewşa wan xirab be jî mecbûrin vê nefeqê te bidin. Ger rewşa nefeqetdanan xirab be, dibê ew mecbûrin varîyeta xwe bi zarokan re bi avahî wekhevî parve bikin. Giranîya dayîna nefeqetê we bi dahatî û serveta nefeqetvan re were miqayese kirin.
2. Ev nefeqe dibê tîne ji xerc û mesrefên kulekan be û tenê ji vê armance were xerc kirin.
3. Ger kesên kû nefeqet didin, bi awayekî bidil nefeqa xwe nedin, dê mecbûr hûn ji wan re temîyek bi nivîskî bişînin da kû ev nefeqe bio rîya dadgehê were girtin. Di derheqê vê armancê kerema xwe ji serî li daîreya cîwanan an jî li Mehkemê din. Ew dikarin agahîyên sereke bidin we, lê nikarin agahîyên kanûnî bidin.

III. Bi tenê di dozên serweriya ne hazir de

Tu gereke di çarçoveya qanûnî de ya ku dadgeha karûbarê mafê serweriya zarokan destnîşankirîye hay ji milk û malê kesê/kesa ne hazir hebî û tu herweha di çarçoveya berpirsiyariya xwe de xwedan mafê temsîlkirina kesê/kesa ne hazir î.

Heger cihê rûniştina kesê/kesa ne hazir piştra eşkere bû yan heger ew mir, wî çaxî divê dadgeha karûbarê mafê serweriya zarokan were agahdarkirin.

IV. bidawîanîna serweriya xwedîkirinê

Erkdarkirina te bi dawî dibe

- a) bidawîkirina serweriya xwedîkirinê ji aliyê dadgeha karûbarê malbatî ve yan bidawîkirina serweriya ne hazir ji aliyê dadgeha karûbarê mafê serweriya zarokan ve, û herwekî din jî
- b) di dozên serweriya xwedîkirinê de ji bo keseka/kesekî ku dikeve ber serweriya dêbavîtiyê de, dema ku serweriya dêbavîtiyê yan serweriya giştî were bi dawî kirin,
- c) di dozên serweriya xwedîkirinê de ji bo zarokeke hîn di zikê diya xwe de, dema zaroka were diniyayê,
- d) di dozên serweriya xwedîkirinê de ji bo dabînkirina hindêk karên tekane, dema pêkanîna van karan bi dawî were,
- e) di dozên serweriya xwedîkirinê de ji bo keseka/kesekî ne hazir, dema ku biriyarara dadgehê derbarê îlankirina mirina wê/wî bikeve warê cîbecîkirinê yan dema ku mirin were tesbîtkirin.